ORHAN KOTAN

Bİ SERBİLİNDÎ

Lİ CÎHANÊ

DİNÊRİM

Werger: BEDİRXAN EPÖZDEMÎR

yek bi yek, hezar bi hezar em dimirin
bi kerb û germî, bê xem emê vegerin
em dostan jî dijminan jî dinasin
bila nekevin tengasîyê yên birîndar û ketî.

bi serbilindî

li cîhanê

dinêrim

Ji ber ku jana di dilê min da ji kêra serhildanê ye
Ji ber ku ez herî ya xwe bi hêrs û bawerî tevdidim
û bi ser xeman de
û li ser karkerên rengavêtî de
hêrsa serê çîyan belav dibe ji min.
lewra ew rik a kubi agirê xwe min li ser lingan dihêle
lewra ew şefeqa ku di çavên min de çirûsk vedide
afîşên xwe nîşandanan
pankertên mêrxas
û bi hezaran milîtan
ronahîya deryayên kûr
beyanîyên dijwar
rûyê asîman û lale
wek kulmekê şidandî dikevine jîyanê em.

lewra ew keça ku ez
wek jîyanê
wek gelê xwe jê hezdikim
/ku wek gelê min
nikare helbestên xwe binivîse,
û stranên xwe bisitrê
bi hezaran û bi hezaran tê gulebaran kirin
li zincîran hatîye xistî
ji cengan ra hatîye şandî
ku wek gelê min bi bacan girêdayî
ji bêkesî yên felçkirî ra berdan
li nava janên giran û hêstirên çevan da hiştin
helbestên minê yên ku wek kêrek dibirqin
di stranên şoreşî da
û lêvên wê yên ku serhildanê hîndikin
bê ku carêkê bikaribim maç bikim
carêk bî jî min
bêtirs carêk be jî girtina destên wê
yên veceniqî wek şev havînên sarîn
heta stû û zendên lingên wê
bê seqandin, bê seqandin, bê seqandin
min dilê xwe da cenga navdar
lewma dimeşime çîya yên aşîtî û azadî yê.

/ger mêrxasî bihedîne min
ho parêzgerê
qedexeyan
bêbextîyan
û rêbiran
bibire dengê keçê min yên stranbêj
û lawên min yên merxas,
wek gor kolana xemgîn û bi hêrs
wek tov reşandinê bi huner
û bi mijandinên virt û vala
û şopên
birçîbûnê
û zilmê
wan destên min

yên li tirpan û necaxan lefandî

di kaşên kûr de kişandî

li mawîzeran pêçandî

li zincîran bixe ger dikarî.

Ger tu ji vê ra jîyan bêjî

ji jîyana wek ka û gîya re bêjî jîyan
wek kûrmek li erdê dikişe
dipelçiqe
bêrûmetkirî
mijandî
bi re-zî-lî.

qelîşîna gulpikê
nebîhîstina qîjîna zarokê nû bûyî
gulgivînîya yarê
singe wê yê lerzîn ku min têr maç nekir
bi saw û tirs
bi kerb û şewat
her roj hîn ji kûrayve
hinekê dîn bi histina mirina reş û tarî
birçî û bê pişmerî
wek segan gevzandinê ra
ê bêjî jîyan e
bila ev dil
tirq û biteqê lo !

em werin ser tava biriqî
ya gelên kedkar
gelên merxas
ku ax bi şehwetê dikişîne nava xwe
nuha pir germe
nuha nayê ragahandin
ji fekîyên gihayî dagirtîne
baxçeyên biharê ji cîhanê ra digêhîne.
û jîyan li ser lêvên yarên gulgiwînî
banga me dike ji bo ceng û evînî.
ne ji bo ku kêr gihîştîye hestî
tîr ji kevanê derketîye
ji bo ku dawî were li selteneta bezirganî
nemîne ev zordarî.

ji bo rojên ronahî
di rêya cîhaneke nûh da
rûmeta mêrxasîyê di rûyên wan da
û hêza bîrewer ya cîhana tekoşer
cîhana ku li dijî emperyalîzmê şerdike
û xortên tekoşer ku biken dibezine
mirinê
bila ala wan ya sor pêl vede
pêl vede, pêl vede
ji bo ku dilê westyayî yê dîya min
dilê ku bi rik va digevizî
ronahî bibe.
dîya min ya ku karesatan dîtîye
diranên wê yên ketî di devê xemgîn da
çevên wê yên bi hêstir
ziravê wê
û bêdawî
û aramîya wê ku çîyan dihelîne,
bi dilovanî.

ango bi rewşekê tevayî mirovatîya me
ji bo ku xwe bişo, paqij bibe di kanîyên zelal da
ji bo ku namusa xweydana enîyê rizgar bibe
ji bo ku kilora germ azad bibe
pîvaza tûj
û basmeyên bi kulîlkan
me sond xwar
wefa kir
sere xwe danî di vê rê yê da
yê bimrin wê bimrin dostino
dijminino heyy
yên dimînin
…
..
.

1969-70

te bi kenên xwe yên nazenîn
dîyarîdikin zarokên çev hêşîn
sax nahêle min ev evîn
sax nahêle wê bikûje min.

Pêşmerge

zêr dizane
zor dizane
devê tifinga mor dizane !

çirûskan berhev dikim û zêde dibim
ji ocaxên şewitî û şewtandî
di zikê min da ji meydanên şer mahşerek
ji hezar kulman qîyametek
davêjin sitêrk yek biyek, cot û cot
serhildan
xencereke
ji xwînê
xwîn, ji polaye,
vekirîye sirma çekan
namus, rût û tazî li holêye.
û azadî,
ku gotina yekeme di pirtûkan da.
sirma mawîzeran
sirûda serxwebûnê diafrînê ji çîyan
ala, li serê namluyan
fitîlên dînamîdan di paşila wî da
û kevirên heste di çengê wî da
çirûskan berhev dike û zêde dibe…….

tovê ku min reşand bi xure-xur dibe axê
gumîna gelên serîhildayî
ji ocaxên şewitî û ruxandî çirûsk bilind dibin
antenên min bi çeteyên bergirî
yên ku bi bîbilikên gelê min hatine rextkirin
va têne girêdan
û lewra malzaroyên bûkên min kef-kefe
û bi hêvîya kuştinê qehir û jîyan
di serda jî birçîbûn û darxaçî
û birînêkê rip û reş:
bê welatbûn
ji bo vî ye derizîna zîndanan di rûyê min da

ji bo vî ye ku wek gurmîneke esman jîyana min li çîyan.

tirs bi bêbextîyê ra dibe yek
ez bi çeka xwe ra
ango serxwebûn xewstî ya çeka mine.
û sorbûna hesin di pizotê rijîyê da
û bi qije qij şoreşa girdavan
artêşekim ku bi qirçîn şîndibim
ku ji gelên eşîr destanan tîne
tekoşîna min
ji bo êşên dilê serdemê ye.

13-15 çile 1970

rehjena min
di beyanîyeke
şoreşê da

di berbanga sibêda
gumîna baregehên serhildara ye
xonçe ji kûlîlk bûnê ra amade ye
gava heval ji kozikan xwe rast dikin
ku dilepite cîhan
û gel tev pişt didine hev
tev digerim
radhêjime coşê bi himbêz kirinê
di şaneyên min da erdhejînên volkanîk
û di çirûskê çevên min da
şitleke nûh, qure û dilkêşe jîyan.

pencera xemê nîvalî dikim
bi hêrs dikevime cîhanê
diqirçe di bin giranî ya min da cîhana kevnar
û pêşberê min derdikeve
kavilên koşkan
çîrokên eware dibêjin
lê pora sipî ya dîya min gowah e
gowaha mine bûka min ya ku li ser zarok çû

û bi fatîhên gorên reş yên zarokan.

meriv dikarê merkûjîyên nermijî biponije
dikarê xwedê biponije
û mîrên bêhiş
bide runiştandin di kûrayî ya wateyên mîhraban da
lê sosret e nizanim çima
bêdawî ya esman wuha dûr
sekna bereket bûna axê wuha hûr
rêyên ku bi termên mihaciran tijîne
birçîbûn
û hêjarîya zayenda mirovatîyê.

sedem eve pişkaftina mifrezeyan ji ordîgehên dagirker
şahdemarên xwe girêdidin bi bergîrên gernas ra
sedem eve li kolanên paytext
bêtirs digerin tekoşêr
û wek xençerek ji kalan keşandî diteyîse
û ji min re ji birînên xwe yên bixwîn
şoreşeke
ku gihîştîye menzîla xwe
di hemû demên rojê da.
ey rûmeta cîhana gunehkar
ez evîndarê te me.

evîndarê
te me

ji kovana herîkîna avên har
wek jineke ciwan dilerizê ax
ji keşmekêşa gemara bajêr dûr
ronahî û hêvî ya tazî
te jîyan
şerêkî yek bi yeke
bêderew û bi mêrxasî.

te jîyan şerekî yek bi yeke
li ser koletî û xwekuştinê çî heye
di rawestina kombûna hêstirên çevan de
him xewên xemgînî yên bûkan
him xema çûyîna xerîbîyê yên mêran
yanî xişim û rik
yanî tirpana janê
evên ku kerba wan hatîye gulebarankirin
destên wan destbent kirî
yên li ber kap
ji zîndanên ku cîyên taybetî didine nasîn
ber bi koşkên siltanên barbar
inyat ji wan ra evên ku bi bêbextî li hev dixin
bê vir û derew
heya dawî bi mêrxasî
te jîyan şerekî yek bi yeke.

ji çevên zarokên birçî
ez bûme dilsojê te
ez rehjanên xwe xwîn dikim û darbaz dibim ji axa te
evîna te di dilê min da wek weşîyeke har diavêje

hêrsê ji kalana wê tazîdikim.

ango dixwazim bêjim ku

hilpekîn û sekna li dor min
coşa cîhanê ye
lewra rêça min ya
ku ji şîna koletîyê tê
wê destana serhildana birumet bilind bike.

coşa girseyên serhildayî
wê şev bi te ronî bibe
wê herîya sibê bi te bê li hev xistin
evîndarim
evîndarê te me
berbanga ku ji singê pale hatîye pişkaftin.

Bang

bi hêvîya ku kelijîn
zarokên xwe yên nehs nexinqînê.

xemrevînî hemin hêsaye
wek kilamêkê merxas li bajêr gerîn
ji çîyan re destanan ponijîn hêsaye
bi qajînekê kêfxweşî ketina zîndanan
di singê candar yên keçanda, di çapxananda
û cîhanê nû kirin di pêgirtinên komcivînanda
hejandina li rûberê cîhanê hêsaye.
lewra bayê serpêhatîya bi hezaran gernasan
guleyek jî nîne ji namusa mawîzerê ra
bi vekirî dîl î ji bo bêbextî ya dil
qada cengê ya esil bêdenge heval
bêxwedî ye
gernasên mîsoger tiryakin,dilnermin.
nexwe
zilma ku di girdaba bajêr da tê keyan
ne nîşana serildana gel ya bi nave û denge.
her çiqas tu bi neynûkên xwe
nivîsên bi xişim li ser dîwarên serdaba dikolî jî

belavokên ku hilweşîyane bûlwar
xercbûna hewqas ked, hewqas bedel
bilqandina xilte ya metal
karanîna rotatîfan
tiştêkê wek derzî kirina termane.
û dem bêdeng çevdimiçkîne bi telaşî
bi zûrîn herikîye û çûye
ango ev
dirameke rûreş e idî
lewra
ew zilamê ku kovanên vale dixe cercura xwe
bi kêmasî
pêwîste ji xwe şerm bike
ango dibêm bese êdî
kilamên xwe ji bo çîya yên min bêjin dibêjim
destên xwe dirêjbikin dibêjim
dirêjbikin
em hev nasbikin
helalbikin.

hinek caran bahoz û bager e
hinek caran êşkence û zîndan
wek guleyeke jengar di singê me da ye
di nav dil de cîh dibe bê westan.

li hemberî
dost û dujminan

ev stran sipardeya çîya yên mor in
ji girtîyên revî ra çengek av
şirtek stran ji yên hundir ra
şarêkê çînî ye ji sindoqa cihêz ra
ji çiçikan ra şîr
û bereketa biharêye ji axê ra.

nasitire di nav şîna çar diwaranda, di nav têlên bi strîn de
ev guleyeke dilêre di lûla mawîzerêda
pêşî xela-şikîn, zemherî
paşî revîya agirî
belalûk
û binefş e.

têlekî asurî lêdixe, yê dî keldanî
û her demsal hêşîn e
niftegonî
soringa xwînî
tehma wî ji xwêy ya lêvên qemerî
li Ferat
li Dijle dixe
hê heyy
di nikulê baz da
sûretê can e.
porreşa min
gulgwîna min
evîna min
ev stran
siparde ya çîyayên mor in.

gava roj li rûyê seqimî dixe
dilivê dilê asmanî
şewqa wî bi keser
îşlikê wî xwînî
evîna wî kendalêke.
çavên wî pingilêke
çavên wî xencer
çavên wî mêrxasî ye.
keda wî kulîlka gîyadawûdî ye gula min
destên wî dîlawer
û bi huner.
li pişt çiya yên mor
sê destanên gewre
sê cîhanên girs
sê hevkêşe
sê şifre
sê dendikên atomê
û hesteyek
çirûskek
û dînamîtek pê re.

ku roj li rûyê berf qemitî dixe
strana çîyayên mor tê
ew di singê tavê da agir
li serzemînê kulîlkên nû bûn
di namlûyêda fişeka namûsê
di serhildanêda dil
di xewa reşda
rastîyên çîlspî bûn.
nazenîna min
evîna hezar salan
li qeraxê tebatê da
kefa rikê
di sêva sorda
di simbilanda
hesrete di lêvên gul da.

…
..
.
can sivik be xwîşka mina nazenîn
bê girîn
bê reşgirêdan
ji kêfa şevên desthineyê
bi lorke, bi govend
ji temiraxa
tu stranên xwe bêje.

19-23 Berçile 1972

heya ku keran bihuner
li hesinê sor bixe
hêvî
tu car tê neşikê.

pêwîste tu
bi namlûyên
ku berê xwe dane menzîla xwe
temaşa cîhanê bikî
wekî şoreşgerêkê
ku di xwîna wî da bager digere
wek biharekê bi bereket
ku kulîlkan direşîne li dora xwe.

çemêkê boşî
li çîyan-li giran
tu ew xwînî ku rehên min germ dikî
pêwîste tu
bi namlû yên
ku digêhjine armanca xwe
li cîhanê biniherî birê min
tu serhildana gelên dîl î.

tu serhildana gelên dîl î
di armanca hevbeş ya bi hezaran qutûban da
jîyana te
xencerek
tazî û pola ye
hêvî
qendîleke pîroz e li cem te
 û evîn
aşitî
û bereket
dibare ji hunerên destên te.

hêrsa çeteyên çeksipartî
kîna dilên milîtan
û yê namûsê
têkoşînê
azadîyê
şitla azadîyê

mezin bibe wekî bihareke bi bereket
kulîlkan li dora xwe bi reşîne.
mezin bibe
bila destên te dirêjî çeteyên kamboçî bibin
bila ji bolîvya xwe bi mîtralyozan girê bidin û bên
li dilê bi agir yê rojhelata navîn bixin
mezin bibe
janên min yeko-yeko hilgire

di rehîma gulên serhildanê da mezin bibe

wek bihareke bi bereket

kulîlkan li dora xwe bi reşîne.

…
..
.

24 çiriya pêşîn 1970
12 çiriya paşîn 1972

ji libek genim
hezar bereket tine
hêvîya ku
ji tetikê
bi şehvet disilike
memkê zindî yê jineke
dimijî dimijî
fişek di mawîzerê da har dibe
û çavên te
dojeha mayînêke peqandî ye
dema çîya dilivin û xwe rast dikin
av
bi harî herikî
gupik di serê çiqil de nehênîyek
hogir ji kemîna cendirman difilitin :

destên spî movik-movik henedayî
di xemile ji şînê şîneke nazenîn
di morê de moreke dilevîn
û destan
ronî dibe ji berbangên belek
birê min (……..)
helbestên min dengên xwe direşînin li çîyan
û bereketa xwe berhev dikin
li Dîjle kefeke bi xwîn
li Nemrûdê cemed
û dilê çeteyî
bêtirs
kêrek biriqî ji pola
çavên har yên eşkîyayek
ji qerenfîl dilopêk.

Dema çîya dilivin û xwe rast dikin
av
bi harî herikî
gupik di serê çiqil da nehênîyek
hogir ji kemîna cendirman difilitin :
hêvî.

hêvî
memkê jinêkê zindî ye
dimijî dimijî
fişek di mawîzerê da har dibe
û çavên te
dojeha mayînêke peqandî ye
hogir ji kemîna cendirman difilitin :

roj ji şaxên çilspî diqete û tê
hêvîyê tevî evînê dike û tê
dost çiqas kerb hene hiltînê û tê
ji çîyayên morîn, silav dike karxezala min.

wek peyameke şifre nederxistî
tê tu di nav çewan da bisekinî

helbestên
adarê

derîyên şevê zêdeke
nîzeyên tehdayê
êşê û xemgînîyê
û xiyanetê zêdeke :
êdî em dikarin xwe darazînin !

1. rêzik:

“li vê cîhanê mirin ne tişteke zor e
ya herî zor damezrandine jîyanekê ye”
mayakovskî

ev bêrî
êşa koçberîyê ye
tim demeke kevin tîne
çûyîna bê vegere
vegera bêdîtine.
û aramî
li çiqlê rikê gulpikeke soring
wê biweşin mehên payîzê yên xemgîn
bê goşt-bê nan, bê êzing
roj tê xela-şikîn
roj tê fîgan û zarîn
wê biweşin çînên hêvîyê
wê biweşin xewên sar yên girtîyan.
roj tê meydanêkê xwepêşandinê ye
roj tê
em li çokê xwe dixin sond dixwin
serê namlûyên me wê bibirqin
roj tê wê di navenda meydanan da
emê yeko-yeko bêne gulebaran kirin.

em ku baxçewanê hêvîyêne
dil di çiqilê rikê da evîn diafrîne.
em li qeraxê dîjle destana demîne
bûkên ku di êşên bêdeng da parî-parî bûne
û çawên wan
li kemînan
bi qaçaxçîyên ku wek fişne diqelişin
ji bexçê yê gul cilmisî yê cîhanê
ji dilgeşî ya zipzirav ya zarûkên ku nazên û dimirin
dayîkên me yên ku şitlê gulan direşînin û derbaz dibin
di nav destanê arîn û zarîn de tên.

tovê ku di axê da bergirtîye
ku biherike ber bi rûyê esman va
ku dûkel ji qûşxana kelî bilind bibe
gulpika xeydok ku li ser çiqil biqelişe
û kûrê min yê di zikê jina min da
diwarê rehîmê yê tenik bide ber refsan
bigêhêje wê qajîna mezin
bila bimeşê ji hezar salan virda
lekeyên bi xwîn yên zulmê
gewher
bila bi reşayî ya rijîyê bêlêdan
lewra dil
li ber guleyên qatil
bi vêketin û vemirin
bi lêdan û ketinê delala min
bi harbûn û hêrsbûn
heta kêra rikê ya pola biçirûske
bi seqanî-seqanî pê bibe û bizivire
wê gûrî ya hêvîyê zêde bibe.

2. rêzik:

> “faşizm bi hindikayî divê tekoşêrên bijare
> bi fizîkî ji holê rake. Armanc têkbirina vê
> listikê ye. «

vaye berbanga sibê ye ev
cotêk çavên evînê
çavên ku tavan mezin dikin
di seqema beyanî da çîyan
rûyê esmaneke xef pêdibe û disekine
bê şefeq in
disilike berbang
li ber xwe dide şev
birînek
janek
ji çîyan tê pirsek
û hêrsê li çiqlê rikê dielkînin
ku bigêhje.

li ser pêwîstîyê tê rawestandin:

dojehek e
ji çarika cîhanê ra
divereşe darxaçên xwe
diqelişin reyên tazî yên mejî
neçar e
dil tivilkî dipitpite
hêvî
li himber tifingên rekbar
di nav kerîyê pîranha da
wek caneke winda ye
û pelendaran
qûndaxan
bombeyên gazê
hezar û yek sal zîndan
êşkence
mirin:
av bêdengin.

av bêdengin oy
çengek kesk di şaxên ciwanik da
û serbanên biax bimij in
xerîbek di tema kewê da ye
taya bijehir ya xemgînîyê
veqetinek
xîzanîyek
mirinek
û gulrengînîyên jina mina ciwanik
her diçe û reştir dibin.

Ji ber ku lûla çekan zengar e
wek kulîlka pîvokeke xafî û narîn
li pişt çîyayên mor
keçên min yên bûk li pişt çîyayên mor
bêdengin, bişînin keçên min yên bûk.

3. rêzik:

“bedelê têkşikanê canek nîne.”

ku te şitlên rizyayî yên xemgînîyê
bi destên xwe mezin kiri bin
li ser her şaşyek xêzêkê stûr dikşînî
û pê li zengilê qirêj yê tunebûnê dikî
xort bûyînî
bê berpirsîyarî
nîxên xwe yên derzî pola derbazî stû yê xwe dikî
li qehbetî ya rûyê dost yê faşîzmê dikenî
şitlên ciwanik yên gel
serhildan û rika xwe
bi bergirtinên hezar salan yên sekinî
gulpika xwe ya ji pelên hevrîşim
ji tavê digurizînî
“xwîşka dilê min ya porsor” ku lê ji hîvê dihezidim
bi gotinek dertixime zemherîyê
wek kêçekê bêhiş bi inyad
wek çilpêyêkî gazîkirî yê mihrîvanî
di xwekuştinên hişdarî yên dîn û har da
te li bagera rehjena xwe xisti bî
bi xiyalên rûyên bajêrvanî
wek mawîzerêkê şikestî
min bizane !

oy li min-li min bizane min
tîrêjên tavê yên dawî li çîyan
û li serbanê bi ax yê ocaxên ku hêvî divemirê
di binê şikeftên windayî da
ku di kemînê da disekine mirin
bizane min.
û tu min
dostên min
dostên min yên ku hatine gulebaran kirin
di rehjena mirinêda cemdindina xwîna wan ya soring
dijê tirsê
bêbextîyê
rûreşîyê
ku wek dilopên şebnem dimeşe evîn
di hinarika fişekan da ta-ta ye tevnepîrîk
çavên te
çavên te yên binefş-binefş
qewirîne
xizan
bijan
û di kûra rijîyê da
ku kevokên spî têne xençer kirin
bizane min
oyy li min, oyy li min.

ben avêtine stûyê min
kişandine heval
di mejîyê min da falinç
di dilê min da qansêr zêde dibî
û ji tenêyîya hezin ya çîyayên şilopgirtî
wek straneke xerîbîyê sekinîye jîyan.

4. rêzik:

«hêvî ku carek ji hişkkirinê ra bê berdan
wekî din zêde bûna gemara şeveke îdî.
dilê gelan li wê disekinê. »

me stêrkên xwe lib lib ajote şevê
ji ronahîyê rêyan raxist
û ku dilop dilop dihelîyan stêrkên me
ku ditefîya hêvî li ocaxên banbiax
ku li êşeke bêdeng hezar singû bi hevra li me diketin
me ji nûh va destpêkir bi tavê ra ber girt.

di vê demê da hinek hilweşîyan
tirs
wek mejîyekî rizyayî
di serîyan da razayî
hatin gulebaran kirin li serê çîyan
ji zarokek bûyî ra bû xelat navên wan
hatin ji bîr kirin
lê tirsa wan ji bîr neçû.
…
..
.

westiya yê bajêr ji şeveke alkol yê zengar
ji pirtûkê
wek tevkujî ditirse ji şevên generalî
ji îzgehan ra
radaran ra
nûçeyên ajansa ra
û
di malbêçî yên jinên wan da
mastûrbasyona faşîzmê
hilweşîyan ji xeyalên xwe yê burjûva.

îdî çîya çîrokeke bi êşîn
û zanîngeh
bermayî yê doza xwînê yê feodalekî
bi girîn diçine gerdegê bûk
nizanin kilaman bêjin zarok
ji tûneyîya te
çavên min wek tirbeyên ewlîya hezar salî…

5. rêzik:

> « pêwîste meriv be bîr û bawer bî û gava meriv tîpa yekemîn ya têkoşînê binivsînê ; ku evîndarî be, hêvî be û ronahî be; meriv bizane; ji xwînê, ji zilmê, ji mirinê xirabtir, wê êşên dijwar bên û li wê gorê gav bavêje. »

wê kîna çeteyan zêde bibe
yek ji nurhakê
yek ji Gilale wê bi hilkişe û bê
stran dibin revîyek agir
wek sêvê ji çiqil tê hilkirin
wek ji dêmên gulîn yê yarê dikeve
bi têlên sitrin yên zulmê tên şidandin.

zarokên ku alan daçikînine stûna
di komikên gola xwînê da destaneke dûrin
zarokeke birçî digrî digrî bêsekin
bûkek bi tilîya xwe rehîma xwe vedide
dayîkek dikeve tenurê, diqele
di îzgeyê da ziravî ya sazê, dabeşa neyê.

kîna çeteyan mezin dibe
bajêr hêdî hêdî bêdeng dibe
û rojên te bêçare derbaz dibin
piştî keserekî ruxandî
ji bedelê xwe dikeve ev cîhan.

ku kelebçe li destên te yên hulhulî dixin
bê hêvîtî diçike dil te dikojê
û tirs
birîneke bêbexte di hundir da dişixule
xîyanet xencera xwe li rehjanê dixe
tu yê bifroşî lawo
tu yê bifroşî gulxonca xwe ya nebişkiwî.

28 Sibat/ 3 Adar 1973

6. rêzik:

« ku jihevketin destpêkir, tu yê li ber xwe bidî. »

tirsê bi êşê va kesixandin
xortanîya xwe vereşîyan
ji dilên ku bi hezar derdan hatibû badan
evîn bi hezar û yek dojeh hate daxkirin
û bi kilaman
li rûyê cîhanê xistin
tirsê bi êşê va kesixandin
bi bêdengî ya hemû lêvan
gerdekê
bi bêdengîya bergirtinê
coşê
hêvîyê
û bêdengîya têkoşînê
û di şevên ku singû dibû padîşah
di girtîgehan û şaneyên êşkencê da
êşê bi birînên nêm va şidandin
laşên xwe yên ciwan vereşîyane jîyanê
zmanê tirsê bi agir kesixandin.

pêwîste rehên nebzê îdî bê leke bavêjin
bê derew, bê şerm û bê heyf lê hatin
bi keys lê bixe ev dil.

7. rêzik:

> «jevketin ji têkoşîna bêserûber ku teda û zordarî pê tê araste kirin dest pêdike, cîyê ku ji girsan ra tirs û qurf tê niçilandin.»

li qerexê kef bi xwîn ya rikê
bi kînê hatîye seqandin ev dil
yan dê biqelê û hişk bibe
li navça çola lêxistî
hatîye avêtin ji kûrayîya bîran ra
bûye lêpok ji zordar ra.
yan tê jehra xwe birjînî nava xwe
har bibî di nav agir da.
yan çevên se dilsoz û hêmin
bi zarezarî
û di stû da xiştên hesin…
na dostino
ev nîne
çeka min
evîna min
hêvîya min
dîlê bêra forseyek nîne.

li qerexê kef bi xwîn ya rikê
bi kînê hatîye seqandin ev dil.

di xwişe xwişa beyanî yên rojên sayî da
wek veşîyeke ku ji axê dipijiqe
wek guleyek ku çikilîye armanca xwe
wek xwînê
wek jînê
bi gumîna serketî ya têkoşînê.

gotina nerêk ya
dawîya vê helbestê

îdî sekin û sekan tuneye birano
li kêleka te termê evîndara delal
li alîyê din têkoşereke gundî
ji dûr karkerên dost têne gulebaran kirin
û li rexê din yê cîhanê
di çerxa bêbext ya çengek dolar da
gelên gernas têne kerîkirin.

ev hisab
hisaba ax û nan e
zilm û zordarîyê ye
bêrî û evîndarîyê ye
îdî sekin û sekan tune birano
bila biçingê borî ya têkoşînê li şaxan.

Adar 73 Melezgirt
Tebax 73 Enkere

ll.

li nîverasta enîyê da
jîyan lêdanêkê bi ezabe
û qeder
bênder ra
êş û çilekeşîyê ye
merxasî li ser sifra zilmê da
ragirtin jî
berxwedan jî

paşeroj tê van wiha binivsînê.

paşeroj tê van wiha binivsîne

wê paqij bibin rojên berxwedanê
paqij bibe têkoşîn
dost jî, dijmin jî wê paqij bibin
rûyê esman ji xwînê
ji nêmê vê azad bibe
li esman
di avê da
di axê da
bi perenga pêşîn
wê paqij bibe cîhan.

mildana zordarî yê zore
hejarî yê
mildana êşê
dildarîya têkoşînê ku agir vedireşe
wek fermaneke dardakirinê bi bela ye
wek hêvîyeke dûr tenê ye.
û wek mayîn raxistine
hisap û kîsap dîtin
bi çîyayên zincîrkirî ra
piştî dost çiqas doste
dijmin çiqas dijmine zanîn
bagerê
tofanê sing kirin
têkneçûyîn
neruxîn
zore.
li vê cîhana kepaze
ku ji bûkên ciwan yên birçî ra kemîne
û gore ji canên teze re
ragirtin
berxwedan
û wek alayêkê şidyan
li dijî zulm û zordarî yê
bêbextî yê
sekin
zore.

zorîyeke din jî heye bêguman
ku li ser nîverasta enîyê da
xetma xîyanetê
û di qêrîna singê te da
tirs razayî bî
rojên ronak xeyal kirin
bi evînî
zarokan maçê kirin ji dil û can
û bikaribî
bi serbilindî
li cîhanê binêrî…

helbet tu yê kesî tawanbar nekî
ku hêvî ji bîrên kor ra dîl bû
bawerî hatibî zincîr kirî bi zîndanê ve
wek kêreke kor bêmecal bî
wek çekên vale bi şîn bin
westîyayî bin
ji koletî ya hezar salan
wek peyameke şifre nederxistî
we tu di nav çevan da bisekinî.

hînare ji dostên
têkoşêr ra

ji bo cîhaneke nû birano
ji bo çîhaneke nû ev têkoşîn
ev zilm
ev xwîn

ji bo cîhaneke nû birano
ji bo cîhaneke nû ev tebat
ev zûrîn
ev inyat

2.

termên zarokên birçî û qehbikên piçûk
demokrasî ya selexane li ber dîwaran dilerizê
li kolanan parsekan da îxtilal gutikên rebena li xwe dike
û lewra fînans kapîtal bi şewqa xwe ya avzêrin ya kolonyal
û bi rîhê xwe yê dirêj û spî
pêwendîyên xwe bi meclîsên netewî va perçîn dike
bi diranên har yê dolaran
derbazî rehjanên çîyan dike.
xwekujîyeke kevnar di kevçika dil da
inyad li şoreşên hulhulî yên serhengên cuntayî
û ji bo xatirê xatira yên artêşên dagirker
hey çevê te bixwim demokrasî
ya ser biqiloç
ya kelemçe kirî jî.
û esnafên lêpok
û hemû hîlekar û bênamûs
çiwîk danaynine ser têlên têlgrafan
zîndanên tirsê runiştine li ser dilê teze
û berhewa bûye kilama reş ya birçîbûnê
li ser misulmanên xîzan yên pênç wextên selayê.

4.

vaye welatê min bûye cendera zulmê
qulik û milik qesabxane
erase gîyotîne.
êvaran, di şûna nanda
qehir tê ser sifran
û bişev ne bi kulfetên xwe ra
bi êş û xeman ra radizên insanên min
fenekirine eşaîran ku cejn û seyranan kavêj dikin
stran û awazên wan derewin
derewe têkoşîna wan
li milê dî yên çîyan
piştan di tewînin
ocaxan di şewtînin
li vî milî
şêlandin
û talan.

xîyanet bi destên xwe yê hulhulî û bi dilê xwe yê kujyar
di hewşên mizgeftan da darêxaçî datîne
xortên gernas yê serxwebûnê
di xwekujîyên mawîzeran da ne
xalidê cibrî, seyît riza di xwekujîyên mawîzeran da ne.
şikeftên dersimê stranêke heyvronîne
bi kumzirxê xwe yê spî mîrê mîran îdî naqîre
serkantî-komcivîn bêdengin, hulhulîne
û bi fîyaqa xwe ya pêxas enîya neteweyî
hinek marks hinek hîtler
begên kurdan yên hatine serjê kirin
di gorên xwe da tên gulebaran kirin
û di elfaba burjuwa da mistefa kemalek.

nîr li van çîyan
bi navê biratîya gelan
li stûyê stranên henedayî hate xistin
di van çîyan da zikên jinên ducan hate qelaştin
di van çîyan da serxwebûna rasteqîn hate serjê kirin.
lê hê sar nebibûn lûleyên tifingan
pêl li serên bi xwîn yên zarokan dikirin
û rizgarxwazên netewî dimeşîyan
rizgarxwazên netewî ji bo qirkirinên netewî.
…
..
.

…

nanê me tunebû
berikê me tinebûn
axa me ya ku
me bi hezar canan
hêvîyek diçand tune.
lod bûn mirî wek çîyan
û namûsa me li bin lingan.
…
lanet bûyî
zar û zêç birçî
jinên me, dewarên me.
…

ewên ku
me kiloreke reş
serîyek pîvaz bi hewra par dikir
bi potînên korikkirî bi saqoyên xwe yê çermîn
artêşên dagirker nebûn
ew leşkerên kuvayê netewî bûn
ku em li kêleka hev bêrê û resim hatibûn veşartin.

ji rewşê nizane
qamçîyên bi xwîn yê zulma cendirman
rê nade zîlana bi xwîn
of off offf lo
li dû me alayî ya suwarî
li ser me mîtralyoz dibarî.

7.

dosto mabesta van gotina yeko-yeko eve, ca ku
tu bizani bî ketî nava têkoşîneke çawa.

tîfo û kansêr
û hêtêş
duşaxe
têrnekirî ya dil, ûrkolî û wekî din
û hemû zêndîyên zîyandar yê êşikan
yek jî birçîbûn
yek jî zulim
di ser da jî zîndan.
padîşahê xweza vizîneke tenha ye
şitil lawazin
li çîyan sancîya hêvîyê bi kovan
tov di nav axê da bi xwîn û rewan.
û stranên me bi xwîn û rewanin :

«zivistane gul nabişkivin
li ser çiqla bilbil naxwînin
dil dixwaze dest nagêhjê
waxx limin
birîndarim
ji hundir
ji hundir yar ji hundir
jêke dilê min yar ji hundir »
aha namûs
ji kerba xwekuştinê diponije
û ev kesera beroşa vale ku xelas nabe
fedî dike ji xwe bi xwe
axa ku serbiser nade
cot
û gayê pîr.
zarokên
birçî-tên
neçûn
ne bendewar hene
û li çîyan
firarên tiptazî.

destana
nehrî

berxê nêr
bona kêr

alîyeke min erz-î mîrî
yê dîn xeracîye ye
zîndana ku ez tê da dirizim
şitildanka gelan e.

ew axa ku ez tê da hatime veşartin
zevîya hezar salan
li her cihî
bi evîndarî hatîye ajotin
ku di weşîyên xwe da hezar û yek kulîlk tîne
û kulîlkên
çiwîkan…
bi çavên xwe yên şilopîn
zarokên eşîra
bi zincîran
di kemînan da nayên girtin
di kilaman da têne gotin.
di hunerên destên min da
dilê wî dirgan ciwan
her alî
bi evînî hatîye lihevxistin
fatîhayeke hinekirî ye
qajîna zêrin ya zarokê nû bûyî.

ew çîya yê ku ez li ser nedirapim
an şeve
an zulme
an koletî.

Ji dojehê xwe bi kerbê dipêçin û tên
di taca serê wan ya bi xwîn da berbanga zincîrkirî
avêtina zereqa tavê hulhulî ye
û qereqolên sînor
ji termên qaçaxçîyane.
Ji bo gelên koçber xeme
kerbe.
Ji begên eşîran ra xwekuştin
Ji bûkên rûken ra kesere.
kesere delala min
kesere belakira min
kesere dilmayî
bêçare
bêdeng
kesere:
xencera kurda ya ser qewsokî
destikê xwe ji dara gilyazî
pola yê wê çil roj û çil şev
heta hestiyan hatîye avdan
aqil ji zanayan
ji mezinan bîrewerî daye hev
û ji jinên eşîran dilsozî
ji destanan mêrxasî hilanî ye.
zman yê urarto
destên wî li turuşpa simbil simbil vedibin.
ew çîya yê ku ez li ser nedirapim
xemkêşî ye
uşûr e
û kelebçe ye.

helbet
wê gul vebe
wê dengê me fêkî yê xwe bide
wê bêjin di stranek de me.
ku tav lê dixe vedibe
ku zilim lê dixe dikeve
ku benê me hatîye kişandin
sedem
/hukumeta bêşeref û zorker
ji mehabadê
heya rewandûzê
heya cizîrê
ben avêtî ye
û kînê hûnandî ye.

axa ku ez jê şîn bûme
ji serhildana gelane
ji min ra dibêjin şêx ubeydilahê nehrî
xwîna min
ji avên kurdistanê ye.
bi êş û azar e
bêçare ye
westa
û birîndar e.

û spîka çevên min
xwîn diniqutînê şevê
û destên min qurmiçîne
şel bûne.
axa min bêvaç
kulîlka min dilketî
di dilê min da
di nava dilê min da
guleyêke xayîne koletî.
ne dûmeqesk difire
ne beytik dikeve
tenê paşayên osmanî
dîwan saz dikin
darêzgerî dikin
yek jî
siltanên sefavî yên destbixwîn
mora min dielqînin li ser sêpikê
silav dikim li gelê xwe
bila serî daneyne
kemberbest nebe.

simbilê ku ez jê qelişîm
ji keda gelane

girê ya dilê min vedibe
an ji zîndanê
an jî ji zulmê têm.

van destên min bigre di agirde biqelîne
gul
û gulpika min di şevêde birizîne
zor û eza
pêwîstkirinê bîne:
gulpika ku di serê çiqil da vebûye
bila di pencera min da neqerise
keçên min
hêyy canê min
keçên min yên bûk
sedem ku
di zulim û zîndanê da ber bigrin ji min
di tayê dane.

ev çîya yê ku ez li ser nedirapim
an zulme
an uşûre
an koletî.

ji min ra dibêjin ubeydilahê nehrî
alîyê minê yekem jandar e
yê duhem mêrkûjî
alîyê minê sîyem zîndan e
teda ye.
aqil û hiş nagêhjê alîyê minê çarem
çev dibîne
zman nabêje.
kedera dergûşa mine alîyê minê pêncem
dojehêke alîyê minê şeşem.
hêvî ye
dildarî ye alîyê minê heftem
nayê zanîn alîyê minê heştem
nehem alîyê min ji koletîyê
yê dehem ji xîyanetê ye.

rêya ku ez lê dimeşim
li dîjle kef bi kefe
li ferat med e, cezîr e.

û dilê kesk yê mezrabota
bi kutana hesin
bi qewartina mermer
bi qulkirin û derketin ji diwar
ji bereketa biharê
ji domandina zîldanê ye.
ne payîz tê serê belgê
ne zivistan rehên zman digre
ew zindana ku ez tê da dirizim
şitildanka gelane.

di şûna
dawî da

bêgemare-bêzengare, xwerû û zelale dilê me
ji bênamûsan ra xencereke bixwîn e gotina me
pir dûre dostino rêya me
hezar silav li yê ketî û têkoşêran re.

tirmeh-tebax 74 enkere

fetlok

ji rûyê ku êş lê tê ditirsim
ji diltepîna ku tirs pê hatîye hesikîn
alava ku çirûskan xistîye çevên min
ji ber girtina bêbextîya merdîyê ye

nemerdî ya zilmê xema min nîne
şewatên napalim ji derve yê xema min in
birîn bibine qanser biseknin jî
qet disekine fişeka ku di lûlê da biteqe

kerba agirpij ji dil hilîne
heya dawî kela xwe birijîne
razan ji mirinê ra merheba dane
bêdengî

xwekuştine

derbaz bû û derket ev dil ji gelek teşqelan
wê hêj sing bide gelekan
binamûs bûn êdî têrê nake
li kevirê mehenga namûsê lêxistin gereke.

Jîyana wek helbestêkê milîtan hîn xweştir e.*

Gelek dostên min gava min dibînin, qala helbesta dikin. Bi taybetî jî pirsa “ gelo tu helbest dinivîsî?” ji min dikin.
Dirêj –li gor temena mirovan- di nav qetên demên dirêj de carna tiştina dinivîsim. Ew, gelek caran , bitenê, bîr û bawerîyên kesîf in. Bê guman ev ne ew helbesta ku ez lê difikirim, dijîm û êşên bê dawî dide min û min dixe heyecanê ne, ango ew ne helbesta jîyanê ne.

Ev demêke ku wekî neferekî tekoşîna netewî û civakî ya welatê xwe, ez hewl didim, erkên xwe bi cîh bînim. Di vê merhelê da, her çalakî, her tewr, her bîr û bawerîya metînî, ji min ra wekî perçeyên destaneke mezin tê.

Demêke dirêj e, di fabrîke, zevî, xwendegeh, gundên çîyê û seranserê sînoran de, bi sedan milîtanên ku bi girseyên gel ve bûne yek, mil bi mil, destaneke pîroz dinivîsin û dijîn. Di vê wateyê de, di nav pîvanên ku tê zanîn de, helbest nivisîn bêguman tiştêkî xweş e. Lê jîyana wek helbestêke milîtan hîn xweştir e.

Di gel êşên mezin û bi xwîn, destana comerdî û fedekarîyên bê hempa tê jîyîn. Û ev yeka wê bê nivisandin jî.

*(Orhan Kotan, nîsan 1983, Stockholm
ji pêşgotina pirtûka sêyemîn a Orhan
Kotan ya bi navê « Sanci » (Qolinc).

« ziman hîmê hebûna neteweyekî ye… » *

.Tu dikarî, ji kerema xwe, hinêkî behsa xwe û jîyana xwe bikî ?

..Sala ji dayîk bûna min 1944 e. Ez zarokê duwemîn yê malê me. Min xwendina xwe heta lîseyê, li Kurdistanê, li Muş, Seêrt, Erzurumê kir. Min li Enqerê dest bi xwendina unîwersîtê « Dil Tarih Coğrafya Fakultesi » (Fakulta Ziman Dîrok û Êrdnasîyê) kir. Destpêka xebata min a sîyasî ji hingê ye. Ew sal, salên dijwar û zehmet bûn. Hingê kapîtalîzm li Tirkîyê bi pêş diket.
Di destpêka 1960-an de ordîya Tirkîyê dest da ser hukim û jîyana sîyasî pir germ bû. Xort dimeşîn, tiştinê protesto dikirin û tiştina diparastin. Tevgera xort û xwendevanan ku ez jî tê de bûm bênaverok û hedef bû.Hingê mesela kurd û doza kurdan jî bi pêş diket. Di 1959-an de 49 ronakbîrên kurd hatin girtin. Di rojname û kovaran da behsa kurdan dibû, rojname û kovar bi kurdî derdiketin. Lê ez û nifşê me, em li derveyî vê pêşketinê bûn. Ez ji tevgera sîyasî betir, di nav xebateke edebî de bûm.
Di dawîya 1960-an de, xort û xwendevanên kurdan li bajarên mezin yên Tirkîyê û li Kurdistanê komeleyeke kurdî « Devrimci Doğu Kültür Ocakları » (Komelên Şoreşger û Çandî yên Rojhilatê) vebû. Vê komelê pir alîkarî li pêşketinê kir. Di destpêka 1970 de ordî careke dîn hate ser hukim û welatparêz û şoreşger hatin girtin. Welatparêz û şoreşgerên kurdan li hember dadgehên eskerî, li Dîyarbekirê, xwe, tekoşîna xwe, welat û tarîixa welatê xwe parastin. Vê parastinê alîkarî li min hevalên din kir ku em hîn çêtir û kûrtir mesela xwe, doza Kurdistanê têbigihên. Lê di eynî wext de, wê parastinê kêmanîyên me, di ware ziman, tarîx, çand, sîyaset û edebîyata kurdi de, nîşanî me da. Mesela zimanê kurdî, giringîya bikaranîna zimanê kurdî, bi her awayî, derket pêş. Ji lewre di 1975-an de, me weşanxana « komalê » li Enqerê vekir. Ez xwedî û gerînendeyê weşanxanê bûm. Tevî min gelek kesên din, nivîskar, xwendevan, mele, gundî, karker û hwd. Di avakirina “komalê” de hebûn.

“komal” bû gaveke hêja. Me bi qasî 20 kitêp li ser Kurd û Kurdistanê weşandin. Û paşê, gava RIZGARÎ di 1976 a de dest bi weşînê kir, min bi her awayî alîkarî lê kir. ‘Rizgarî” berdewama “Komalê” bû.Vê demê, dema ‘Komal û Rizgarîyê” di warê hişyarbûn, pêşketin û ji xwe vegerînê de, pir alîkarî li kurdan kir. Û paşê jîyana sirgûnîyê, penahendetîyê dest pê kir, di sala 1980-an de.

.Te çawan dest bi edebîyatê kir? Jîyana te ya edebî?

..Hê di zarokatîya xwe de, ez rastî edebiyatê hatim. Di cejnan de, min, şiîr di xwendin.Di lîsê de min di rojnama xwendevanan de tiştine nivisîn. Li uniwersîtê min existensiyalîzm nas kir. Hingê ez di bin tesîra şiîr û edebîyata tirkî de bûm. Min kitêba xwe ya şiîran ya yekemîn “Boyunduruk”(Nîr) di sala 1964 an de weşand. Piştî wê, demeke dirêj, min şiîr neweşandin.
Jîyan aktîf bû û ez diguherîm. Ji xwe, gava min mesela kurdî hin çetir nasî, dîtinên min ên edebî jî çelqiyan û guherîn.
Kitêba duwemîn ya şiîran, “Gururla Bakiyorum Dünyaya”(Ez bi serbilindî li dinê dinihêrim) di sala 1976 an de derket. Paşê xebatên sîyasî rê li xebata edebî girt. Niha jî, ji bo min, xebata sîyası li pêş e. Şiîr ji bo min jîyan e. Jîyana min jî niha digel nexweşîya min, sîyasî ye. Min şiîrên xwe yên herî baş di navbera 1969-1974 an de nivîsîn. Wê gavê tevger xurt bû, zordarî pir bû, liberxwedan geş bû. Şiîrên min yên wê demê encama jîyan û xebata min bû.
Li derveyî welet jî min kitêbeke şiîran weşand. Li derveyî welet nexweşîyeke xedar kete pêsîra min, ez ji mirinê xelas bûm.Hingê min şiîr ne nivisîn û tevî kiteba min “Sancî”(Qolinc) ew weşandin.
Lê ez divê bibêjim ku dîtina min ya edebî, berî 15-20 salan, guherî. Hingê ez hîn çêtir hîn bûm ku ez kurd im û asîmile bûme. Ez bi tirkî dinivîsim, ji ber ku ez asîmile bûme. Zimanê min yê ronakbîrî zimanekî din e. Min hemû xwendina xwe bi zimanê tirkî kir. Meriv 20-25 sal bi tirkî dixwîne. Kurdî qedexe ye. Gava meriv têdigihê ku meriv kurd e, hingê divê mesela zanîbûnê, ji nû ve, dest pê dike. Hingê divê meriv kurdbûnê bi her awayî bizanibe. Wê çaxê meriv têdigîhê ku heta wê gavê meriv bi zimanê neteweyekî din nivisîye û ji gelê xwe dûr bûye. Meriv dikarê derdê gelê kurd bi xwe re nikare zêde tişt bide. Ji ber ku zimanê gelê kurd, kurdî ye. Meriv nikare zanînê

biguhezîne gelê kurd. Şiîr bi zimanekî tê nivisîn. Wergerandina şiîrê pir zehmet e. Şiîr ne wekî çîrok, kurte-çîrok, romanê ye.
Piştî ku ez hatim derveyî welêt min mesele hîn çetir, firehtir, kûrtir fahm kir.

.Niha tiştekî berbiçav li meydanê ye.Li her perçê Kurdistanê ev tişt xwuya dike. Li Tirkîyê hin bêtir. Gelek kurd ne bi zimanê xwe, lê bi zimanê neteweyekî din dinivsînin. Rewşa te jî weha ye. Tiştê ku tu li serê dinivîsî û tiştên ku alîkarî li nivisîna te dikin, Kurd û Kurdistan e. Em dê çawan li nivîskar, hunermend û ronakbîrên kurd ku di vê rewşê de ne, binihêrin, wan çawan bisînifînin?

.. Du aliyên vê meselê hene; aliyê çandî û aliyê sîyasî.Îro, aliyê sîyasî, hin bêtir, li pêş e. Ji ber zordarîyê li her çar dewletan jî kurdî li pey tirkî, erebî û farisî tê. Ma ronakbîrê kurd çi bike, çî alternatîfên wî hene? Heta ew mezin dibe dixwîne û bi kurdîya xwe dihese, ew asîmîle (ji alîyê ziman) dibe. Ji alîyê têgihiştina ronakbîrî, mixabin zimanê ronakbîrî tirkî, farisî û erebî ye. Gava ronakbîrên kurd baş bi kurdîya xwe dihesin, hingê ew li xwe vedigerin. Ronakbîrê kurd ji bêgaviyê, bi zimanekî din li xelkê xwe vedigere. Ji lewra zimanê kurdî dibe zimanê peyvînê.
Pêşvexistina zimanê kurdî jî, dîsan, bi xebata sîyasî girêdayî ye. Hemû ronakbîrên kurd bi kurdî binivisin jî, hawilekî mezin dê bi dest nekeve. Hemû rojname û kovarên Kurdistana Tirkîyê bi tirkî ne. Xelk bi tirkî bêhtir fêm dike. Zanîn bi tirkî diguheze xelkê. Gava Kurdistan rizgar be, nifşekî- du nifş pê perwerde bibe, hingê kurdî dikare li cihê rûne. Li Kurdistana Tirkîyê her tişt bi tirkî tê afirandin. Ronakbîrên tebîî (feqe, mele, seyda, dengbêj) ku di nav xelkê de dijîn, kurdî diparêzin. Ji ber rewşa dijwar, digel ku du sed-sê sed sal derbas bûye, hê jî esereke nû nikaribûye *Mem û Zîn* a Ehmedê Xanê derbas bike.
Şert û merc xirab in. Ronakbîr û nivîskarên herî mezin yên Tirkîyê Kurd in. Ew her tiştê xwe ji kurd û Kurdistanê werdigrin. Gelekî wan vê yekê înkar dikin û xwe wekî Tirk dibînin. Ev awir tiştekî xirap û pir bi xeter e. Beşekî ji wan jî bêdeng dimînin û tiştekî nabêjin. Wekî Yaşar Kemal. Ew her tiştê xwe, bi her awayî, ji Kurdistanê werdigire. Lê ew xwe wekî nivîskarekî Kurd nade nasîn û bêdeng dimîne. Ew dizane ku gava ew wekî nivîskarekî Kurd derkeve meydanê, ewê li

Tirkîyê pir tişt wunda bike û dewletê li wî vegere. Ehmed Arif hîn çetir e. Ew xwe înkar nake. Gerçî ew ne di nav tevgera kurdî de ye û bi aktîvî naxebite. Lê ew xwe wekî şaîrekî Kurd dibîne û pê serfiraz dibe.
Kesên wekî Yaşar Kemal pir in. Meriv nikare wan bi xayîntî bi nav bike, lê dil dixwaze ku ew jî alîkarî tevgera kurdî bikin.

. Baş e, tu, wekî nivîskarekî sirgûniyê çawan dibînî ? Çawan dijî ?

.. Sirgûnî trajedîya sedsala me ye. Sirgûnî ecêp nexweş û neşêrîn e, tiştekî hov û wehşî ye. Meriv ji xwe, ji welat û gelê xwe, ji çand û zimanê xwe bi dûr dikeve. Sirgûnî jîyan û pîvanê merivan diguherîne û wan ji hev dixîne. Sirgûnî êş û jan e. Meriv nikare wekî berê bikêr û xebatkar be.
Bi bawerîya min, meriv divê li dijî xirabî û nexweşîyên xeribîyê şer bike, her tiştê bike çekê şer û xebatê. Edebîyat dikare roleke mezin bilîze. Ji xwe sirgûnî qedera kurdan e. Li welet jî, gava me ji Milazgirê bar kir û em çûn Enqerê hingî ew jî sirgûnî bû.

.Gerçî tu bî kurdî nanivîsî lê bala te li ser edebîyata kurdî ye. Bi qasî ku tu dibînî, rewşa ziman û edebîyata kurdî çawane?

..Li Ewrupayê, di wî warî de xebatekî xweş û hêja heye û ev xebat hêvî dide merivan. Gerçî ev xebata hê jî bi kesan dimeşe. Li Ewrupayê du akademî û enstîtûyên Kurdan hene. Lê hê jî berhemên wan xwuya nakin. Pêşketineke baş heye. Lê terî nake. Divê Kurd sewiya zanînê bilind bikin. Ev jî bi dezgah û rêxistinan dibe. Gelek kar û xebat divê bête kirin.
Li derveyî welêt pêşketin baş e. lê li Kurdistana Tirkîyê xirab e. Li wir tirkî bûye serdest. Herkes bi tirkî dipeyîve û dinivîse. Gelek tişt ji girtîgehên Tirkîyê ji me re tên, ew hemû bi tirkî ne. Xeter di vir de ye. Xwezî niha sînema kurdî hebûya.Tesîra sînema li ser xelkê gelek e. Ger sînema hebûya, wê alîkarî pêşketina zimanê kurdî bikira… Mesela *Zimanê Çîyan* li Tirkîyê, bi tirkî ji alîyê kurdan tê lîstin.

. Wekî şaîr û ronakbîrekî kurd, ji bo rojên bê, çî plan û xebatên te hene ?

.. Ji bilî kar û barên Kurdistan Pressê,’ez niha, ji şiîr û edebîyatê bêtir, li ser tarîxê difikirim û dixebitim. Ev bûn 20 sal ku ez li ser tarîxê hûr dibim. Xebatên li ser ziman, edebîyat, çand pir girîng in. Nemaze ziman. Gava neteweyekî zimanê xwe winda bike, ew huwîyeta xwe ya neteweyî jî winda dike. Lê ji bo ku ev xebat baş bimeşin û bikêr bin, divê meriv li ser tarîxa xwe xwedîyê bîr û bawerîyeke rast û kûr be.
Niha rewşa min a sihhî (tenduristî) pir xirab e. Ez biqasî deh caran ketime bin kêra doktoran. Eger rewşa min hinekî baş be, ez dixwazim wekî projeyeke dirêj, li ser tarîxa nûjen a Kurdistanê, 1806-1976, bixebitim û binivîsim. Ev wext û dem tarîxa Kurdistanê de, bi bawerîya min pir girîng e. Wekî kurdekî, ez dixwazim vê wextê binivîsim. Di warê edebîyatê de jî, ez bi hêvî û heyecan im. Lê rewşa min û rewşa sirgûnîyê rê nade ez binivîsim.

*(Kurdistan Press-26 sibat/1990
rûpel/14 hevpeyîvîn a Mehmed
Uzun bi Orhan Kotan re.)

PÊŞGOTİN

Bedirxan Epözdemir

Navê Orhan Kotan, ji xwendevanên Kurd û Tirk ra ne xerîbe. Xwendevan, Orhan Kotan wek sîyasetmedar, rojnamevan, nivîskar û helbestvan nas dikin. Ewî, heya dawîya temena xwe di van waranda bê westan xebat kir. Ez bawerim ku bi kirinên xwe wê Orhan Kotan di dîroka gel da cîhê xwe bigre. Bêguman bi stîl, zman û naveroka berhemên xwe, wê Orhan Kotan bibe babeta lokolînê ji bo lêkolînvana.

Armanca vê pêşgotinê, dûr û dirêj li ser jîyan û xebata Orhan rawestin nîne. Ev babeteke dîye. Divê bêalî em temaşa jîyan û xebata rewşenbîran û her wuha ya Orhan Kotan bikin. Pêwîste rexne bi zanistî rola xwe ya payebilind bileyze. Di zanistîyê da cîhê reşkirin û metihkirinê tune ye.

Min, Orhan di dawîya salên şêstan da naskir. Di gelek waran da bîr û bawerîyên me cuda bûn. Alozîyên salên heftîyan pir dijwar bûn. Bi navê îdeolojî û sîyasetê kambaxîya wan salan nayêne jibîrkirin. Sedem wî min û Orhan jî hev gelek êşand. Me ji hev hiz jî kir û em li hev qehirin jî. Dostanîya me heya dawîya temena wî bi rengeke vekirî û bi prensib meşîya. Ligel cuda bûna, gelek tişt li gel Orhan hebûn ku meriv îro jî dikare wek nimûne wan biparêzê. Bêtirs bû, arşîvwaneke bê hempa bû, bi disîplîn û bi inyad bû.

Sedem ku nikarîya bi kurdî bixwîne û binivsîne gelek xemgîn bû. Dema li jîyanê bû çend caran pêşnîyar kir ku ez helbestên wî wergerî-nime kurdî.Piştî çû heqîya xwe xanima wî ya hêja Mehtap va ku ez wê wesîyeta wî bicîh binim.Min jî vî deyneke wefayê zanî, pirtûka wî ya bi navê "Gururla Bakiyorum Dünyaya" (Bi serbilindî li cîhanê dinerim) wergerande kurdî. Ev werger li ber çapa çaran ya pirtûkê ku ji alîyê Çiviyazıları va hatibû weşandin pêk hat. Cîyê mixabê ye ku dema çapa çar pêk hat, Orhan piştî çend rojk çû dilovanîya xwe û çapa nûh nedît.Heya nûha sê pirtûken helbestan yên Orhan Kotan bi tirkî hatine weşandin; Boyunduruk (Nîr) 1964 li Enkerê, Gururla Bakiyorum Dünyaya (Bi Serbilindî li Cîhanê Dinêhrim) 1975 li Enkerê û Sanci (Qolinc) 1984 li Stockholm . Herdû pirtûkên dî jî di

destê min da ne, ku mecal hebe ezê wana jî bixime xizmeta xwendevanan.

Qasî du sal ez li ser wergera vê pirtûkê xebitim. Min xwest ku bêqisûr xwendevanên kurd bigêhjine tema helbestên Orhan Kotan. Ez, bi xwe piştî wergerê bi tevayî gihiştime vê temê. Di encamê da min dît ku Orhan, helbestbêjê dîrokçe ya me ye.

Bêguman, werger tişteke hêsa nîne. Ku ev werger helbest be û bi tay-betî imza yê Orhan Kotan li binî be barê meriv girantir, dibe. Şik tûneye kêmasîyê min jî hene. Hêvîdarim xwendevan min bibexşînin. Ku ez piçek be jî tema helbestên Orhan Kotan bidime xwendevanan, ez xwe bextîyar bizanim.

Pir spas, ji dost û hevalan ra ku di derheqê wergera vê pirtûkê da dîtin, arîkarî û pêşnîyarên xwe ji min ra texsîrnekirin. Ji ber vê yekê ez careke din ji kûrayî ya dil Orhan yad dikim. 03.07.2001

Têbinî ; Em gelek spas dikin li Kek Bedirxan Epözdemir ra ku ji bo destur bidin wê berhemê tên weşankirin.
www.gelawej.org/orhan-kotan/